

Kurmanciya malperên kurdî û zimanê rojnamegeriyê

1- Destpêk

Kesên ku bi pirsgirêkên zimannasiya kurdî ve mijûl dibin, heta ku ji wan tê, bala xwe didin çapemeniya kurdî û edebiyata wê jî.

Bi qasî ku mirov dibîne, digel ku ew qas kar hatine kirin û di gellek waran de yekîtiya zimanê kurdî di nava her zaravayî de kêm zêde hatiye sazkirin jî, hê jî hin pirsgirêkên ku bi qereqtera nivîskariya kurdî ve têkildar in, çareser nabin.

Ji nebûna redaktorên şareza bigire heta bi nebûna pîvanên çapê û nirxandinê, weşangerên kurdî, û herweha edîtorên kovar û rojname û malperan, di bin vê tometê de ne.

Ev kêmaniyên rastnivîsandinê ku em ê behsa wan bikin, kêm zêde di « hemû » malperên kurdî de hene. Em ê di vê nivîsê de bi mînaka du malperên kurmacî ve hewil bidin ku van kêmaniyên nivîsandina kurmaciya internetî nîşan bidin.

2- Zimanê Netkurdê

Ji cerga ku Netkurdê dest pê kiriye, di nava rojnamegeriya kurdî ya internetî de cîhekî xurt wergirtiye. Kêfa xelkê zû ji wê re hat, lewre vê malperê li ku tiştek li ser kurdan hebûya, li cem biyaniyan jî, li cem kurdan jî, hemû li ser hev dicivandin, yan kopye dikir, yan jî werdigerand û bi vî awayî rojeva Kurdan ya internetê pêşkêş dikir.

Lê belê, rojnamegerî ne bi tenê kopyekirin an jî wergerandin e. Rojnamegerî ne bi tenê sazkirina nûçeyan e jî. Em di vira de behsa rojnamegeriya kurdî dikin. Heke mijar rojnamegeriya kurdî be, hingê divê em behsa zimanê kurdî jî bikin.

Di Netkurdê de du xeletî hene ku tim balê dikişînin. Yek jê nebûna ergatîvê ye ku êdî di malperê de bûye fenomenek ku em ê li jêrê behsa wê bikin. Lê hin mînakên mîna ya jêrê jî hebûn ku di rastnivîsandina kurmaciya malperê de dibin mînakên baş.

Ev nûçeya ku mînaka me tê de bû, di pêvajoya pîrozbahiyên Newrozê de hatibû çapkirin.

« Li bakur pîrozbahiyên Newrozê destpêkirin »

Ger hûn bala xwe bidin lêkera vê hevoka ku weke sernivîsê hatibû bikaranîn, hûn ê bibînin ku lêker bi hev ve hatiye nivîsandin. Lê di kurmacî de, êdî herkesî li ser li hev kiriye ku lêkerên bi vî rengî gava ku tên tewandin (an jî kişandin) ji hev cuda têne nivîsandin. Kesên ku pirtûkên bi zimanê kurdî dixwînin, dizanin ku herkes dê wê lêkerê mîna ya jêrê binivîsîne.

« Li bakur pîrozbahiyên Newrozê dest pê kirin. »

Bê guman, heke mirov dîsa behsa ergatîvê bike, em ê bibêjin ku di lêkerên hevedûanî yên bi vî rengî de, divê lêker yekhejmar be û ev yek di gramera Celadet Bedirxan û dersên Kamuran Bedirxan de jî hatiye gotin.

Hingê diviya bibûya :

« Li bakur pîrozbahiyên Newrozê dest pê kir. »

Di heman nûçeyê de hevokeke weha heye:

« Li Bîngolê Newroz di bin berfê de pîroz kir ».

Weke ku hûn dibînin, di vê hevokê de lêker vê carê rast hatiye nivîsandin, lê belê "Li" hatiye serê hevokê ku berê hevokê bi temamî guheriyê û wateya wê tev li hev kiriye ku mirov nema dikare ji nav derkeve. Hingê em nema dizanin bê "kê Newroz di bin berfê de pîroz kiriye". Lê em bawer in ku hevok dixwaze bibêje :

« Li Bîngolê, [Kurdan] Newroz di bin berfê de pîroz kir. »

An jî, bi tesîra hin bikaranînên zimanê tirkî ku jê re « ad aktarmasi » dibêjin :

« Bîngolê Newroz di bin berfê de pîroz kir. »

Em dixwazin bi mînakeke din vî beşî bi dawî binin :

« Barzanî di mesaja xwe de spasiyên xwe yên ji bo wexwendina wî ya bo pîrozbahiyên Diyarbekirê diyar dike û ku ji ber karên xwe ê nikaribe beşdarî pîrozbahiyên Diyarbekirê bibe. »

Peyva « beşdarî » bi awayekî ecêb di malperê de derketiye ku em ê behsa wê nekin. Ev tê wê wateyê ku nivîskar li nûçeya xwe temaşe nake.

Di vê mînakê de mijar "ravekirina axaftina kesin din" e. Ji ber ku berê yek diaxife û nûçegihan radigihîne, du axaftin pêk tên. Hingê divê em baş diyar bikin bê kî dipeyive û çî gotiye.

Di vê mînakê de em fahm dikin ku Mesûd Barzanî nameyek şandiyê û "**spasiyên xwe diyar dike**". Heta "diyar dike" pirsgirêk tune. Lê belê piştî wê hertişt tev li hev dibe. Em fahm dikin ku "**ji ber karên xwe, [ew] ê nikaribe beşdarî pîrozbahiyên Newrozê yên li Diyarbekirê bibe**". Lê belê ji ber ku hevokeke Barzanî di nava axaftina nûçegihên de hatiye dubarekirin, diviya lêkerek hebûya ku pêşberiya vê axaftina wî bikira. Ev hevok rast hatiye guhertin, ji ber ku "Ez" a Barzanî di axaftina nû de bûye "Ew", ji ber ku êdî "EZ" dibe nûçegihan. Lê belê, piştî guhertinê, lêkerek mîna "gotin" an jî "lêzêdekirin" diviya bihataya bikaranîn. Hingê, heke em wê hevokê ji nû ve binivîsin:

"Barzanî di mesaja xwe de spasiyên xwe yên ji bo wexwendina wî ya bo pîrozbahiyên Diyarbekirê diyar dike û [DIBÊJE] ku ji ber karên xwe [EW] ê nikaribe beşdarî pîrozbahiyên Diyarbekirê bibe."

Bi vî awayî em dizanin bê kî dipeyive û peyvên kê radigihîne û wî kesî çî gotiye. Lê belê, pirsgirêkeke din jî heye. Ji bo çî nûçegihan peyva Barzanî di « dema nuha » de radigihîne ? Dibe ku ev jî bi bandora zimanên ewropî be. Lewre Ewropî pîraniya ragihandinê bi vî rengî û herweha vegotinê wêjeyî jî bi dema nuha dinivîsin ku ev awa li kurmanciyê nake.

Mijara ravekirina axaftinê kesine din ya di zimanê rojnamegeriyê de ji bo me tim bûye pirsgirêk. Mînakeke ji rojnameya Peyama Kurd dê di vira de gellekî bi kêrî me were.

« Orgeneral Başbug got ku YE, avayiya dewletê ji bo mînaqeseyê vekir, em vîya nikarin qebûl bikin û dom kir, « Dewleta uniter ya heye ya tune, orta vî karî nabe ». (Peyama Kurd, n° 10, 12.11. 2004, r. 3)

Ya rastîn Ilker Başbûg roja 02.11.2004'an ev gotin di civîneke çapemeniyê de kirine. Rojname ji bo deh roj bi şûn de tê amadekirin. Di vê mînakê de du demên cuda û herweha du axaftinê cuda hene.

- 1- Axavtina Başbûg
- 2- Axavtina nûçegîhanên Peyama Kurd

Ilker Başbûg, gava ku dipeyive dibêje “em vêya nikarin qebûl bikin”. “EM”a Ilker Başbûg “artêşa Turkiyeyê” ye, lê belê di axavtina nûçegîhîhanan de jî ew “EM” her wekî xwe hatiye hiştin. Hingê di vira de “EM” kî ye? Ji ber ku nûçe ji aliyê kesekî din an jî kesine din ve hatiye nivîsandin, diviya ji dêleva “EM”a Başbûg, “EW” bihataya bikaranîn. Lewre, di axavtina nû de Ilker Başbûg û hevalên xwe dibin kesên sêyem. Di encama veguheztina axavtinên kesine din de, “EZ” dibe “EW”. Herweha bikaranîn û pêdiviya bîhnoka berî « YE » (Yekîtiya Ewropayê) jî nayê fahmkirin.

Hingê ev mînak diviya weha bihataya nivîsandin :

« Orgeneral Başbug **got ku YE** avayiya dewletê ji bo minaqeşeyê vekiriye [û] **EW** vêya nikarin qebûl bikin û dom kir (...) »¹

Em bawer in ku ev mînak bes in ji bo ku mirov fahm bike ku pirsgirêkek di bikaranîna kurmanciyê de li cem rojnamegeran heye. Lê belê, bê şik, ev pirsgirêk teknîkî ne. Herkes ne mecbûr e ku bibe zimannas, lê belê divê di malperê de an jî di rojnameyê de yek hebûya ku hayê wî ji van mijaran hebûya û hemû nûçe kontrol bikirana. Ji bo Netkurdê jî û Azadiya Welat jî (ku em ê behsa wê bikin) û ji bo Peyama Kurd jî heman pirsgirêk heye.²

Di ravekirina axavtinên hinin din de mînakeke Fransiyayê ya navdar heye ku ji ber wekhevîya bikaranîna lêkerên axavtinê û gîhanekan, em dikarin ji bo kurdî jî bi kar bînin.

Em weha qebûl bikin ku Azad ji Xecê re dibêje « **Ez ji te hez dikim** ». Xecê jî bila biçe û vê agahiyê bide Serdêr.

Hingê Xecê dê, li gora mînakên ku ji malper û rojnameyan hatine wergirtin, weha bibêje :

« **Azadî ji min re got ku ez ji te hez dikim** ».

Di vê hevokê de gelo kî ji kê hez dike ? Mirov nikare tê derxe. Lewre, axavtina ravekirî divê wê derfetê bide mirov ku mirov bikare axavtina yekem jî tê de baş nas bike. Di vira de du axavtinên yekem dikarin werin derxistin :

Azad ji Xecê re : « Ez ji te hez dikim ».

Azad ji Xecê re : « Tu ji Serdêr hez dikî ».

Lê divê Xecê axavtina xwe biguhere û kesên axavtina yekem li gora dem û kesên axavtina nû veguhezîne. Lewre him dem guheriyê û him jî kesên ku tev li axavtina nû dibin diguherin. Heke weha be, kirdeyên vê axavtinê jî divê li gora rewşa axavtina nû werin guhertin.

Hingê, Xecê dê weha bibêje :

Azad ji Xecê re : « Ez ji te hez dikim ».

Xecê ji Serdêr re : « Azadî ji min re got ku EW ji MIN hez dike ».

¹ Di vê mînakê de, mirov dikare lêkera « vekirin » bi forma medyatîfê, weke « vekiriye », binivîsîne ku behskirina wê dikare me ji mijara me bi dûr bixe. Ji ber wê, em ê wê mijarê bihêlin nivîseke din.

² Ji ber ku *Peyama Kurd* êdî nayê weşandin, pêdivî pê tune ye ku mirov behsa nimûneyên din bike.

Mirov fahm dike ku heke lêkereke axavtinê bê bikaranîn, hingê dikare behsa axavtina ravekirî bibe û bikaranîna gîhaneka « ku » jî ji xwe vê yekê nîşan dide. Heke ne weha bûya diviya ji dêleva gîhaneka « ku », axavtina Azadî biketaya nava neynûkê.

Xecê ji Serdêr re : Azadî ji min re got “ez ji te hez dikim”.

Di axavtina Serdêr û Xecê de, heke gîhanek were bikaranîn, « EZ » Xecê ye, « TU » Serdar e û « EW » Azad e, lewre di konteksta nû de êdî « EZ »a Azadî dibe « EW ».

Ev agahî ji aliyê gellek kesan ve baş tên zanîn. Di romanên kurdî yên ku em li ser zimanê wan xebitîn de jî me dît ku digel ku hin nivîskarên me rast bi kar tînin, hê jî gellek nivîskarên me vê hêla zimannasiyê çewt bi kar tînin.³

2.1- Ergatîva Netkurdê

Ûcar em dikarin behsa ergatîvê bikin. Li ser malpera Netkurdê, roja 08.05.2007'an, nûçeyek belav bû ku sernivîsa wê ev bû û vê mînakê kir ku em li ser vê mijarê hin mînakên din berhev bikin û rewşê zelal bikin.

« Mêrdînî lewheya ANAPê avêtin sergoyê. »

Heger li hin deveran, bi bandora rewşê, ergatîva kurmanciyê wenda bûbe jî, li gellek deverên din û bi taybetî jî li Mêrdînê hê jî ergatîv heye û mixabin Mêrdînî gava ku vê sernivîsê dixwînin ecêb dimînin ku nivîskarên kurd bikarin xeletiyêke rastnivîsandinê ya weha bikin. Pêdivî pê tuneye ku mirov behsa hevokên din bike, hema bi tenê di sernivîsê de sê xeletî hene ku gellekî giring in. Em ê jî vê sernivîsê li gora van xeletiyên bi sê qonaxan sererast bikin.

1- Di kurmanciyê de gava ku lêkereke gerguhêz di demeke bihurî de were tewandin, hingê divê kirde jî li gora wê tewandî be.

Yanî, ne « **Mêrdînî lewheya ANAPê avêtin sergoyê** », lê belê gerek bibe « **Mêrdîniyan lewheya ANAPê avêtin sergoyê** ».

2- Di kurmanciyê de, dîsa li gora zagonên ergatîvê, hejmar û kesaniya lêkereke gerguhêz ku di demeke bihurî de hatibe tewandin, li gora hejmar û kesaniya bireserê diyar dibe.

Hingê, « **Mêrdîniyan lewheya ANAPê avêtin sergoyê** » jî nabe û divê bibe « **Mêrdîniyan lewheya ANAPê avêt sergoyê** ». Ji ber ku « **lewheyek bi tenê hatiye avêtin** ».

3- Di sazkirina vê sernivîsê de bandora fikirîna bi zimanê turkî jî heye ku divê were destnîşankirin. Mêrdînî tucarî tiştêkî navêjin "**sergoyê**" lê belê diavêjin "**ser sergo**" an jî (heke mirov purîstê tewangê be) "ser sergoyî".

Hingê divê bibe "**Mêrdîniyan lewheya ANAPê avêt ser sergo**".

4- Pirsgirêkeke din jî heye ku peywendiya wê bi vê nûçeyê ve tuneye, lê belê nimuneya wê heye. Ew jî ew e ku, herçend em bibêjin ku "di kurdî de apostrof tuneye", nivîsandina tîpên mezin bi yên piçûk re jî bi mirov ecêb tê. Herweha carinan em tiştên weke "sedsala

³ Di vê nivîsê de cîh namîne ku em yek bi yek nimûneyan bidin, lê kesên ku dixwazin, dikarin li wê lêkolîna me binîherin : AYDOGAN Ibrahim Seydo (2006), *Temps, subordination et concordance des temps dans le roman kurde* (Dem, hevokên pêreyî û lihevkerina deman di romana kurdî de), Thèse de doctorat en Sciences de Langage, Université de Rouen.

19an" jî dinivîsînin û tîpan û hejmaran jî bi hev re dinivîsînin ku ev yek weke pirsgirêkeke rastnivîsandina (ortograf) kurmanciyê diyar dibe.⁴

Çend hefte bi şûn de di nûçeyêke din de jî weha hatibû nivîsandin :

« **Tirk du radaran li ser sînor danî.** » (30.05.07)

Ji ber heman sedema ergatîvê, rastiya wê diviya bibûya

« **Tirkan du radar li ser sînor danîn** ».

Sê roj bi şûn ve jî, vê carê nûçeyêke weha hate çapkirin.

« **Wênêkêş Spencer îcar Hollandîyan tazî kir.** » (3.06.2007)

Em pêdiviyê pê nabînin ku van mînakên jî ji nû ve şîrove bikin. Tenê pirsgirêka ku ergatîv dikare peyda bike, bi vê mînakê baştir derdikeve holê. Lewre, heke rast neyê xwandin, mirov dê nizanibe bê kê kî tazî kiriye.

Lê ev celeb mînak di Netkurdê de gellek in. Berpîrsê malperê, Murat Ciwan jî bi heman awayî dinivîsîne:

« **Polîs êrîş bir ser qelebalixê** »

« **Qelebalixê jî kevir avêt polîsan** »

« **...konvoyêke mezin li pey ambulansê ber bi Şîrnexê ve birêket.** »

Ev hevok di nûçeya cenazeya Orhan Dogan de hatibûn bikaranîn (30.06.2007). Heke zagonên ergatîvê neyên pêkanîn, di ya yekem de mirov dibêje qey polîsek bi tenê êrîşê dibe ; di ya duyem de qelebalix kevirêkî bi tenê diavêje polîsan. Hevoka sêyem jî bi rastnivîsandina lêkerê ve têkildar e. Weke ku tê dîtin, ev lêker dîsa bi hev ve hatiye nivîsandin ku em dîsa vegeyriyan mijara xwe ya destpêkê.

Weku ku Newzad Hirofî digot, « Ergatîv mohra kurmanciyê ye » û beyî wê nabe. Lewre, heke we ergatîv rakir, divê hûn tewangê û grûbên cînavkan jî rakin. Di zimanekî de hertişt bi hev ve girêdayî ne, heke yek jê ket, hingê ew ziman dikare weke xaniyekî hilweşe.

3- Zimanê Azadiya Welat

Di kurmanciyê de, ji ber ku êdî ziman di gellek waran de tê bikaranîn, carinan mirov mecbûr dimîne ku hevokên kompleks bi kar bîne. Kurmancî weke gellek zimanên din derfetên xurt bi rêya gîhanekan ve dide ku mirov bikare peywendiya di nava tiştan de beyî qutbûyinê rave bike⁵. Ev mînaka jêrê di malpera rojnameya Azadiya Welat de hatibû çapkirin. Em nizanin ka gelo di rojnameyê de jî bi vî awayî hatiye çapkirin an na.

Di bûyera piştî girtina Serokê Rêxistina DEHAP'ê **ku xwe fehs kiriye ya Culemêrgê Sabahattîn Suvagci**, dest pê kirin de pevçûn dom dikin û heta niha di encama gulebarankirina polîsan de 5 hemwelatî bi giranî birîndar bûn. (www.azadiyawelat.com, 24'ê adara 2006'an.)

⁴ Dibe ku xwediyê vê rexneyê jî di hin nivîsan de mîna vê nûçeyê nivîsandibe û apostrof bi kar neanibe, lê ev yek nayê wê wateyê ku ev rexne neheq e.

⁵ Ji bo bikaranîna hevokên kompleks, SPITZER Leo (1970).- « Le style de Marcel Proust » r. 397-473 in *Etudes de style*.

Ger em bala xwe bidin vê mînakê, em ê bibînin ku hevoka ku hatiye sazkirin hevokeke kompleks e. Di hevokên kompleks de, ger mirov bala xwe nede hin xalên gramera kurmanciyê, mirov dikare xeletiyên ecêb bike. Heke hûn bala xwe bidin beşê hevokê ku me reş kiriye (*ku xwe fehs kiriye*), hûn ê bibînin ku ev hevokeke alîkar e ku bi fonksiyona rengdêrê ve hatiye bikaranîn. Bi zimanê fransî em ji vî celebê hevokên alîkar re dibêjin « relative ». Bi kurdî tu lêkolîn li ser vê mijarê tune. Bi tenê di ferhenga Grûba Kurmancî de tê gotin ku kurdiya wê « hevokên pêreyî yên peywendiyê » ye. Ev celebê hevokên pêreyî bi fonksiyona rengdêrê ve tîn bikaranîn û bi hevoka sereke ve ji aliyê sentaksî ve girêdayî ne. Lê belê ji bo ku em bikarin bibêjin « rengdêr », divê navek jî hebe ku ew rengdêr bikare wî bişayesîne.

Ka em bala xwe bidinê bê ew nav di vê hevokê de kîjan e. Yanî, kê an jî çi « xwe fesh kiriye » ?

Li gora sazkirina hevokê, çar bersiv dikarin ji bo vê pirsê bînin dayin:

- Bûyer,
- Serokê Rêxistina DEHAP'ê,
- Rêxistina DEHAP'ê û
- DEHAP bi xwe.

Elbet, ji ber ku em bi dîroka partiyên kurd dizanin, em pê derdixin ku ew navê ku rengdêr dişayesîne an jî nivîskar dixwaze bişayesîne « DEHAP » e. Ji ber ku DEHAP'ê xwe fesh kiriye û tev li DTP'ê bûye. Lê belê di kurmanciyê de, zimannas pê dizanin, tîkîliya navekî û rengdêra wî bi rêya tewandina wî navî ve tê sazkirin. Di mînaka me de, navê DEHAP'ê ne li gora vê tîkîliya bi rengdêrê re, lê belê li gora tîkîliya xwe ya bi navê « Rêxistinê » re hatiye tewandin. Ji ber ku ev tîkîlî baş nehatiye sazkirin jî tevliheviya wateyê derdikeve holê. Bê guman, xwendevan ne mecbûr e ku bi dîroka partiyên kurdan bizane. Lê, heke bi peywendiya DEHAP û DTP'ê nizanibe, ew ê ji vê nûçeyê tiştêkî fahm neke.

Hingê mînaka me divê weha be:

Di bûyera piştî girtina Serokê Rêxistina DEHAP'a **ku xwe fehs kiriye ya Culemêrgê Sabahatîn Suvagci**, dest pê kirin de pevçûn dom dikan û heta niha di encama gulebarankirina polîsan de 5 hemwelatî bi giranî birîndar bûn.

Weke ku tê dîtin, pirsgerêkên vê mînakê bi vê guherîna ve jî çareser nabin. Herweha beşê ku navê Sabahatîn Suvagci nîşan dika jî bi serê xwe pirseke din e. Ji ber ku ev beş piştî hevoka pêreyî hatiye nivîsandin, lê belê ev beş bi peyva « Rêxistinê » ve girêdayî ye. Hingê mirov nema dizane bê çi bi çi ve tîkildar e. Ji ber ku gellek agahî hene, nûçegîhan dixwaze van hemû agahiyan bi hev ve girê bide. Ev yek jî, weke ku Spitzer dibêje, wî ber bi bikaranîna hevokeke kompleks ve dibe. Lê belê hevokên kompleks, gava ku mirov nizanibe wan bi kar bîne, dikarin naverokê li bin guhê hev bixin, wek ku di vê mînaka jorê de xuya dibe.

Em li ser malpera Azadiya Welat li hin mînakên din gerriyan, lê em bi awayekî ecêb lê hay bûn ku zimanê Azadiya Welat gellekî tîkûz e û qet naşibe yê rojname û malperên din. Di pevajo ya salekê de Azadiya Welat kêmaniyên xwe ew qasî kêmanî kirine ku mirov mecbûr e ku vê hêla redaksiyona wê pîroz bike. Lê dîsa jî em li çend mînakên piçûk rast hatin ku nîşanên redaksiyoneke nebaş didin. Mirov di cih de fahm dika ku hemû nûçe ji aliyê heman kesî ve nayên redaktekirin, lewre hin cudahiyan devokan ku çewtiyan jî bi xwe re peyda dikan hene :

Midûriyeta Şaxa Xizmetên Zarokan a Serokatiya Daîreya Xizmetên Civakî ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, di nav mehek de 900 zarokên dezavantajî bi seyranê kêfxweş kir. (28.06.2007)

Di vê mînakê de em fahm dikin ku « 900 zarok » hatine kêfxweşkirin. Weke ku tê dîtin, gava ku em hevokê dixin forma pasîv ku bi turkî jê re dibêjin « edîlgen », lêker rengê xwe diyar dike. Ji xwe forma pasîv weke alîkareke ergatîvê tê hesibandin.

Em fahm dikin ku gellek zarok hene. Hingê, dive weha bibûya:

“Midûriyetê 900 zarokên dezavantajî bi seyranê kêfxweş kirin”.

Di vê mînakê de herweha mijara “di nava mehek de” heye. Kurmancî “di nava mehek de” qebûl nake, bi kêmanî, divê bibe “di nava mehekê de”.

Heman awa di hevokeke heman nûçeyê de dîsa hatiye bikaranîn, lê belê balkêş e ku vê carê ergatîv rast hatiye bikaranîn.

« Midûriyeta Şaxa Xizmetên Zarokan a Serokatiya Daîreya Xizmetên Civakî ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, di çarçoveya çalakiyên havînê de 900 zarokên ku malbatên wan xizan in, birin seyranê”.

Me bala xwe dayê ku Malpera Azadiya Welat bi giştî di mijara ravekirina axavtina de çewtiyên berbiçav nake û di vî warî de xwe ji malper û rojnameyên din cuda dike. Bê guman, ev jî ji tecrubeya wê ya salên dirêj tê ku mirov fahm dike ku karekî baş di warê rastnivîsandinê de hatiye kirin.

Bi hêviya ku ev mînak û nirxandin bi kêrî pêşeroja nivîsandina kurmanciyê û rojnamegeriya wê ve were. Weke ku Arîsto dibêje, armanca axavtinê ew e ku bi zelalî tiştinan bibêje. Ev zelalî di nivîsandinê de bi pêkanîna zagonên rastnivîsandin û gramera zimanekî ve guncaw e.

Bibliografya:

- ARISTOTE.- *Poétique*.- Paris : Le livre de Poche, 2003.
- AKIN Salih (2002).- « Discours rapporté et hétérogénéités discursives en kurde » in *Faits de langue*, n° 19, r. 71-84.
- AYDOGAN Ibrahim (2004).- « Derfetên zimên û vegotina wêjeyî » in *Peyama Kurd*, n° 3, p. 14.
- AYDOGAN Ibrahim Seydo (2006), *Temps, subordination et concordance des temps dans le roman kurde*, Thèse de doctorat en Sciences de Langage, Université de Rouen.
- BEDIR KHAN Emir Djeladet Ali & LESCOT Roger (1991).- *Grammaire kurde: dialecte kurmandji*.- Paris: Jean Maisonneuve.
- BEDIR KHAN, Kamuran (1989).- *Le kurde sans peine*.- Paris : Institut Kurde de Paris.
- BRES Jacques (1994).- *La Narrativité*.- Louvain-la-Neuve : Duculot.
- BRUNA CUEVAS M. (1994).- « Le discours direct introduit par QUE » in *Verbum*, n° 1, r. 61-87.
- GUENTCHEVA Zlatka (éd.) (1996).- *L'énonciation médiatisée*.- Louvain-Paris : Peeters.
- HIRORÎ Newzad (2005).- « Ergatîvî mohra kurmanciyê ye » in *Nefel*,
- KLEIBER Georges & BERTHONNEAU Anne-Marie (1997).- « Subordination et temps grammaticaux : l'imparfait en discours indirect » in *Le Français Moderne*, n° 2, 65^e année, pp. 113-141.
- MAINGUENAU Dominique (1999).- *L'énonciation en linguistique française*.- Paris : Hachette.
- RICOEUR Paul (1985).- *Temps et récit*, t. III : Le temps raconté.- Paris : Seuil.
- ROSIER Laurence (1999).- *Le discours rapporté : histoire, théories, pratiques*.- Gilly : Duculot.
- SPITZER Leo (1970).- « Le style de Marcel Proust » pp. 397-473 in *Etudes de style*.- Paris : Gallimard.
- TAN Sami (2005).- *Rêziman û Rastnivîsîna Zaravayê Kurmancî*.- Istanbul: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- ZÊREVAN Arif (1997).- *Bingehên rastnivîsandina kurdiyê (kurmancî)*.- Stockholm: Nefel.
- ZILAN Reşo (1989).- « Reformek Pêwîst e » in *BERGEH*, n° 1-6.